

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



sal 1983

hejmar 8

www.arsivakurdi.org

Geli xwendevarêن delal û şagirtêن hêja !

Ji ber ku dujminêن me îmkan û mecal nadin me ku em bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin yekîtiya zimanê me jî çê nebûye. Kirinêن dujminan hemû ji bo nehiştina me ye. Lê tu xelk bi vî awayî winda nebûne û gelê Kurd jî bi vî awayî winda nabe. Gotinek bav û kalêن me heye: "giyayê şîn di bin keviran de namîne".

Bi viyan em dixwazin bibêjin ku sed mixabin gotinek ku li parçeyekî, li cihekî Kurdistanê tê gotin, li parçeyên din nayêن famkirinê. Ji ber vê yekê em dixwazin gotinêن ku famkirina wan zehmet be, wekheviyêن wan binivîsin (mêze bike rûpel 29). Lê em vê jî bibêjin ku em ne kesên zimanzane ne. Yek caran ji ber gotinekê pir wexta me diçe heta ku em fam dikin yan jî jê re wekheviyekê dibînin. Ji bonî wê em ji we hivî dikin ku hûn di wî warî de alîkariya me bikin. Gava ku we ji me re nivîsandinêن xwe şandin, gotinêن ku hûn bawer dikin ku famkirina wan ne hesan e, wekheviyêن wan di nav parantêz () de binivîsin û nivîsandinêن xwe jî paqij binivîsin ku xwandina wan hesan be. Ku em vê kêmasiya xwe rast bikin wê KULILKA me tim ges be.

KULILK bi silavêن xwe li cem we ye ;

YENDO

Yendo navmalî bû. Banek xwediyê malê derketibûn ko-çeriyê. Rojekê Yendo ji gund hatibû. Malxwê pirsa gund jê dike:

- Lawo Yendo, li gund ci heye ci tune ?

Yendo:

- Bi xwedê qet tiştek tune axe !

Malxwê:

- Virde ? Vêde ?

Yendo:

- Qet tiştek tune, lê mixabin kûçikê we mirar bibû.

Malxwê:

- Kuro Yendo kûçikê me gurxenêq bû. Ne nexwes bû.
Xêr e, çima mir ?

Yendo:

- Axayê min latanê lokê wê xwar. Di gewriyê da ma,
û mir.

Malxwê:

- Lawo Yendo lokê me ne sêle bû. Ma ew jî mir ?

Yendo:

- Ez xulam bila ê mayî sax bin. Di bin darbesta bavê te da westiya. Bavê te çû heqiya xwe.

Malxwê:

- Law Yendo ! Bavê min kengî mir kuro ?

Yendo:

- Axayê min ! Diya te çû rehmetê, li pey rehmetiyê nexweş ket....

Malxwê:

- Kuro Yendo ! Diya min jî mir ?

Yendo:

- Jina te pey xelkê ket, hingî li sînga xwe da ke-ribî....

Malxwê:

- Yendo lawo ; Bona ci tu nabêje agir bi mala me ke-tiye.

Yendo:

- Bi gora bavê te axe, berî ku ez bêm me agir vemi-rand.

QISIRKENO


Hebû tûnebû cotkarek hebû. Navê wî Qisirkeno bû. Hircek dil ketibû Qisirkeno û wê her roj dîvek beranan dianî û dida wî. Qisirkeno hinek ji wî dixwar û hinek jî difrot.

Rojekê Qisirkeno tev jina xwe li malê li ber bixêrikê li ber êgir rûniştine. Jin ji wî dipirse:

- Hewqas dûvê beranan tu ji ku tinî Qisirkeno ?

Qisirkeno got:

_ Jinik qet nepirse ! Vaye te pê kîf kiriye. Tu ê pê çi bike ku ez ji ku tinim ? Wî pastre da bîra xwe ku rojekê hirçê ji wî re gotibû:



- Tu vê sira me ji kesîre bibêje, ez ê te bikujim.
Lê iroj jinikê li xwe kir ïnat û carek din ji Qisirkeno re got:
 - Heger tu nebêje ez ê ji te bixeyîdim û herim mala bavê xwe.
 - Wî ci kir nekir jinik qanîh nekir û jê re got:
 - Jinik ez ê ji te re bibêjim, lê belê tu ji kesî re nebêje. Ku tu bibêje ez ê bêm kuştin.Jinikê pirsa xwe da mîrê xwe ku ji kesî re nebêje. Wî jî sira xwe got:
 - Jinik ! Welle hirçek dil ketiye min û ew her roj ji min re dûvek beranan tîne.....Tu nabê wê çaxê hirçê li ser xêni li ber qula bixê-rikê li wan guhdarî dikir.
Wexta ku Qisirkeno sir ji jinê re got, hirçê ban kir û got:
 - Qisirkeno ! Ma ne sibehê tu ê bê ser cot ? û paştre çû.Bû sibeh û Qisirkeno çû ser cotê xwe. Nêrî ku ku rovî-yek hat. Rovî ji wî pîrsî:
 - Birakê cotkar çîma madê te ne xwes e ? Xêr e tiştek qewimîye ?Qisirkeno got:
 - Birakê rovî ! Hirçek dil ketibû min û her roj dûvekî beranan dida min. Me li mal kîf dikir. Me ewili Şêvra

xwe kiribû û pirs dabû hevdu ku em ji tu kesî re nebê-jin. Lê jina min doh êvarê xwast ku bizane, ew dûvên beranan ji ku derê têñ. Min jî ne xwast jê re bibêjim lê wê xwe xeyîdand. Min jî bê dilê xwe ji wê re got ku hirçê ew anîne. Tu nabê wexta min ew mesela ji jina xwe re got, hirçê li ser xêni li me guhdarî dikir. Wê sond xwar ku vê sibeha min bikuje.

Rovî got:

- Birayê cotkar ez dikarim te ji hirçê rizgar bikim lê berê gerek tu şertekî min qebûl bike !

Qisirkeno pirsî:

- Çî ye şertê te rovî ?

Rovî got:

- Şertê min ji bo rizgarîkirina te gurçikek te ye.

Qisirkeno got:

- Baş e. Min şertê te qebûl kir. Ezê gurçikek xwe bî-dim te.

Wê çaxê rovî got:

- Tu hejikekî li boçika min girê bide, ez ê herim ser wî girî hember, bikim toz û dûman. Wexta hirç bê û bi-pirse: ew ci toz û dûman e ? Tu jê re dibêje : welle deveyêñ mala paşê guri bûne. Li dohnê hirçan digerin li ku hirçan dibînin şerjê dikan ! Wê çaxê hirç wê bi-bêje: min veşêre ! Tu jî wê çaxê hirçê têxe çewalê tov û devê wî girêde û hirçê bikuje. Lê heta ku ez werim



jêr cem te, gurçikek xwe hazir bike.

Piştre rovî bi hejikekî bi boçikê ve girêdayî bazda çû ser wî girî hember kir toz û dûman.

Wextekî şunda hirç hat cem Qisirkeno û got:

- Qisirkeno ! Ma ne iroj roja min û te ye ? Te çima sira me aşkere kir ? Niha ez ê te bikujim.

Lê çavêن wê li toz û dûmana hember ket. Ji Qisirkeno pirsî:

-Ew ci toz û dûman e ?

Qisirkeno:

- Welle hirçê ! Deveyên mala paşê gurî bûne. Li dohnê hirçan digerin. Hirçan li ku dibînin, şerjê dikan. Bez-ê wan dikan dohn û di devan' didin ku ew baş bibin.

Hirç tirsiya û bi dengekî nîv-girî ji Qisirkeno re got:

- Ez qeda te digrim. Min zû veşêre.

Qisirkeno rahişt çewalê tov û got:

- Hema têkeve çewalê tov û xwe veşêre.

Hirç ketê û Qisirkeno dev li girê da û bi daran rabû ew kuşt.



Wextekî din şunda rovî hat û got:

- Bira-ê cotkar ! Kanê te pirs dabû min ku te gurçikekî xwe bidana min ?

Qisirkeno :

- Erê birayê rovî were ji xwe re gurçikekî derxîne.

Rovî xwe nêzîkî Qisirkeno kir ku gurçikekî derxîne. Dema ew hat li ber zikê wî sekinî ew pir tirsiya. Ji tirsê zik got:

- Çççûûûzzzz.....

Rovî pirsî:

- Birayê cotkar ew dengê ci bû ?

Qisirkeno:

- Rovî ! Sala xelayê min du çêleyên kûçikan xwaribûn.

Niha ew di zikê min de pir mezin bû ne. Dibêjin me berdin emê herin rovî.

Rovî bi tirs got:

- Birayê cotkar wan bernede heya ez birevim !


Qisirkeno:

- Here zû baz-bide . Ez wan bernadim lê ku tu şunda were ez ê wan berbidim.

Rovî bi lez ji wêderê reviya û carek din şunda vengeriya.

Qisirkeno hem ji rovî hem jî, ji hirçê xilas bibû. Lê belê ji ðûvên beranan jî mahrûm mabû.

KÎSÊN XWEŞ-TİŞTAN



Şeş kîsên xweş-tıştan, lê ma ci di wan de ye ?


LÊ GERÎN

Gelo tu dikarî peyvên ku giredayîna wan bi hev re
heye bibînî. Wek ku tê diyînê me pêyv kirine rê-
zê. Ji sê pêyvên ku di rêzkêda ye, dudu bi hevra
girêdayîne. Gelo kîjan ?

tas	taxcik	deng
gîsk	ço	bizin
berf	baran	xanî
rûn	beq	mar
mehîn	serêş	canî
potîn	dev	gore
dismal	zembîl	dolbend
giya	kevir	ka
dest	mirîşk	hêk
xo	şekir	şoraxî
masî	ard	av
nan	poz	genim
kanî	quling	bet

şagirt	roj	mamoste
firavîn	nîvroj	bışkov
çem	cêwrik	küçik
ga	şev	gamêş
fil	gund	bajar
hesin	polat	herî
berxik	hîv	liva
dibistan	berf	zivistan
hûçik	dil	gurçik
taştê	sêv	sibeh
rihan	ceh	anix
Newroz	mal	Kawa
bilûr	tifing	tembûr
dotmam	pismam	nal
îsot	xewn	raketin
newal	xela	bircitî
pez	aş	dewar
piling	pisik	neçarı

RENG KIRIN



Li gor hejmaran rengbike !

1- ZER 2- SOR 3- REŞ 4- ZERÊ TARÎ


5- RENGÊ QAHWE 6- KESK 7- HIŞIN (ŞİN)

MÊRXAS

Gundek talanêن wan çûbûn. Zaro digîriyan, jinan porê xwe tev anîbûn xwar û rûyêن xwe ji gîrî û .lîxwedanê sorkiribûn. Pîremêr û kesêن li gund mabûn dipûnijin. Xort û mîrxas bi pey terş û talanan ketibûn, li mi-xabin pol-poşman, destvala vegeiyabûn. Bi kurtî destêن xwe êdî ji talanê şuştîbûn.

Tevaya gund li bêderan belav bibûn. Çavêن gundiyan li rîwiyeke ket. Ew ber bi gundve dihat. Temtêla wî sû-warîyi hêvî ğida gundiyan. Ew li kumêtek kabreş sû-war bû. Hespê dêl û bijî berdayî bû Dîn-din dimeşıya û ji firnikên wê. ji rîdaçûnê firefir dihat. Gem û zînê Musilê xweşikbûna wê bêtir nîşan dida. Sûwar xençera wî di berde, tifinga xwe bi destekî girtibû. Koloz xwarkirî û şalê êlkanî bi gulik û gulabendan xemilandibû. Solêن sextiyan di zengoyê de dişiya. Rextê çarparçe li ser singa xwe rapêçabû û tûncikêن wî ketibûn ser eniyê.

Gava ku sûwêr nêzîkî li malan kir jinek bejn û balek zirav û lihev, qirik dirêj û poz cilak. Tili û bêcî zer wek şîmê. Dev piçûk, lêv tenik, ji rengê xwînê. Hinarê rûyê wê wek gulêن nu bişkivî. Çavêن wê wek çavêن kewê neqîsandibû. Biskê zérîn li herdu hêlêن rûyê wê , belav bibûn mîna bayê baharê û hedî hedî di-hejiyan.



Jinê bi dengekî zelal ji sûwêre lîrand, helan tê da:

- Tu egîtê mala bavê min e ; Xelkê em talan kirine. Em ketin bextê mîrên çê. Mîrxas û egît di rojêñ wiha de xûya dibin.

Halan û navtêdan êdî bi dilê gundiyan tevevî bûn. Sûwar, hêrsa wî rabû. Hema serê hespê ber bi riya çûna talan ve zîvirand û piyê xwe li hespê da. Toz û dûman li pey xwe hişt û ji çavan dûrket.

Wextek şunda, hîna gundî neçûbûn malêñ xwe. Ew li hêviya mîzgînekê mabûn. Carkê dîn ku peyayek hêdî hêdî ber bi gund ve tê. Gava nêzîkî li gund kir, hat naskirinê ku ew sûwariyê wan e, lê şût taziye.

Pîremêrekî gava mîrxas bi vî avayî dît dengê xwe bilind kir û got:

- Lawo ! Yek ji we ji egîtî me re starekê bînin !

Mîrxas:

- Hûn dev ji starê berdin, lê wê porkura ji min re lîrand nîşanî min bidin.

Gero

CINDÎ - CINDÎ BÊZARÊ

Vivace

Hat kav . ra . nê- kav - ra . nê,
cin - dî - cin - dî Bê . za - rê, hat kav . ra . nê-
kav - ra . nê, la min çé . vî be . lek xâ . rê.

Hat karvanê karvanê, cindî cindî Bêzarê,
Hat karvanê karvanê, lo min çavê belek xwarê.



Hat karvanê kalan e, cindî cindî Bêzarê,
Hat karvanê kalan e, lo min çavê belek xwarê.

Ewr ï dor malan e, cindî cindî Bêzarê,
Ewr ï dor malan e, lo min çavê belek xwarê.

Hat karvanê gûzan e, cindî cindî Bêzarê,
Hat karvanê gûzan e, lo min çavê belek xwarê.

Ewr ï dev dûzan e, cindî cindî Bêzarê,
Ewr ï dev dûzan e, lo min çavê belek xwirê.

TÛRIKÊN XWEŞIK



Di nav wan tûrikên xweşik de dudu wek hevin.
Gelo kîjan ?

Nameyek ji xwendevarekî

Hevalên delal !

Ez gelek silavên şoreşgerî û biratî li we û li xebata we ya hêja û giranbiha dikim. Bi rastî kovara KULÎLK, kovareke giranbiha û pir delal e. Bi derketina wê em gelek serbilind û dîlxwes in. Nemaze derketina wê ya bi zimanê me yê zîkmakî me bêtir serbilind dike. Kovara KULÎLK di pêşveçûna zimanê me de xebateke pir giring û baş dilîze. Ez hêvîdar im ku kovara KULÎLK heta ku welatê me Kurdistan ser bixwe bibe jiyana xwe bidomîne. Ji bo domandina wê divê xebata ji dest me tê em texsîr nekin. Ez carek din silavên biratî li we dikim û xebata we pîroz dikim.

Rêncber

Rêncber tev nameya xwe ev helbesta jêrîn ji bo KULÎLKÊ şandiye.

Stêra Tenê Li Asman

stêrek bi tenê li asmanê bilind
çi dema te dibînim wek te ez jî dibim bilind
çirûskan ve dide ger me zanîba çîma ?
wek min maye bi tenê, bê heval ka ?

stêrika melûl bê yar dil bi xem
hêvî me rû şen bibe ji navê were dem
li dor te jî tev kom bibin şîyar û şehban
bike dilan tu rêz bike stêrik û mircan

stêra min gulek zer ji nav baxan
kê tu jêkirî, danî li wî asmanî ?
çi ji te diwên, ci ji te dixwazin ew kî ne ?
çîma wilo dem digerîne rojan li me ?

ey stêra rû ken ji min ra yar û heval
tim bîra min û guhdar, zozan stêr û şepal
bi te ra dijîn em candar û belengaz
bi rê da diçin hozan, rêzan û daxwaz

dûrî min ketî gul tev kulîlk û rihan
ciwan im di rehan xwîn boyî te erzan
dest bi darin tev lî bêr şiyar û xwenda
rêncberên zane sozdarin ji bo te

Rènçber

* * *

DI BİR DE MAYİN



Wextek kurt li wan tiştan binêre û pastre
bê ku lê mîzebike, bifikire bê çend ji wan
tê bîra te.

PILING Ù PISIK

Piling li çiyan li nav darûbaran da li nêçirê digeriya. Rojekê bê nêçir ma. Bîna wî teng bû. Berê xwe da deştê ji bona keriyek koçeran yan jî tersek bê xwedî bigre û firavîna xwe bike.

Piling digeriya, carê dît ku pisikek ber bi wî tê. Li pisikê mîze kir, bala xwe rind dayê, pûnijî û ket gumanan. Pisik hat ber wî û jê pirsî:

- Xêr e birayê delal ? Ci derdê te heye ?

Piling:



- Ez bala xwe didimê şivet û temtêla te malbata me tîne bîra min. Bi her tiştê xwe wek ku tu ji mala me be ! Lê belê tu wiha piçük maye. Nizanim gelo tu nexwes e ? Derdeki te heye ? Tu karîbe ji min ra bibêje baş e !

Pisik:

- Birayê min yê hêja ! Bav û kalê min yek caran ji min ra digotin ku em pisik û piling ji malbatekêne. Ez bixwe li cem tabekî me. Ji wî ra tê gotin mirov. Ji kul û derdêwan bavik bi bavik em heliyan. Ji xeynî vê derdê min tune.

Piling:

- Ma ax ketiye çavêن min ? Ez pismamê te me. Ka tu wî tebayî rayê min bide, ez ê heyfa bav û kalan ji wî hilînim.



Pisikê rêberî kir û pilin meşiya. Rastî cotkarekî hatin.

Pisik:

- Birayê delal ! Ha waye mirovek. Ew li pey hestir- an û halet bi destê xwe girtiye. Mirov ew e.

Piling ber bi cotkar de cû û nêzîkî lê kir û bi de- dengê hêl got:

- Mîrovo ! Ez hatime heyfa pismamê xwe. Bê bêbextî ci sîlehêن te hene , bîne û emana te iroj tune.

Tu ji destên min xilas nabe !

Cotkar bala xwe dayê ku ne xêr e. Di dilê xwe de got:

- Ez awakî li wan nekim, bi xwedê ez çûm. ^ Iroj dawiya min hat. Berê xwe da piling:

- Baş e ez ê biçim malê qama xwe bînîm. Li hêviya min bimîne !

Piling:

- De zû here û vegere. Ez bi tu deverê de naçim.

Cotkar:

- Ez ê çawa bi te bawer bibim ku tu narevî ?

Piling:

- Bi ci sondê dixwaze, ez ê bixwîm.

Cotkar:

- Em neyar in. Ez bi sonda te bawer nakîm. Lê ku ez te li vêdera girê bidim, hingî ez ê zanîbim ku tu narevî


Piling:

- Tu bi ci awayî bibêje ez dikim. Lê tu zanîbe ku iroj xilasiya te tune.

Cotkar rabû bi benbestka cot her çar lingên piling rind girêdan û bi misasa cot, lêdanek xwes lê kir. Piling bê hiş xist, bi cîpê wî girt û termê wî bi dûr xist.

Piştî kateke kurt hişê piling hat serê wî. Çavêن xwevekir li dora xwe nêrî. Dît ku pisik li ber serê wî rûniştiye û hisirên xwe paqij dike. Bi dengekî jar ji pisikêra got:

- A min ji te ra ku tu nebûye kêzik û neketiye qu-la ðiwaran.



MIJÜLÎ



Ji deqê heta deqê (ji 1 heta 38) bikişîne ka
bê çi heywan derkeve.




FERHENGOK


anix	baharatek e
benbestik	bendê ku pê nîr tê girêdanê
bet	teyrek e
bixêrik	mitbex
dolbend	dismal
firavîn	xwarina nîvroatê
firnik	bêvil
hejik	şax, qîrs û qal
helan	navtêdan
hestir	qantir
hêl	bi deng
katek	wextek, gavek
koloz	kumê mîran
kumêtek kabres	cûreyek hespan
liva	heriya berxan
malbat	eşîr, qebîle
malxwê	xwediyyê malê
mirov	însan
navmali	xulam

polat	metalek e
punijî,	
punijandin	di çîrokê de bi mahna fikirandin, fikirî . Lê punijandin guhdarî ki- rin e.
rayê min bide	wî pêş min ke
sereş	êşa serî
sitar	
sitirandin	di cirokê de bi mahneya çekan kin- can da ye. Lê sitirandin parêztin e.
şivet	wesif, durşim
şoraxî	xwarina pir bi xo, şor
taxcik	sêniya mirov xwarinê li ser dixwe.
teba	hemû tiştên bi ruh
temtêl	wesif, durşim, şivet
term	laş
tov	bizir

X A Ç E P I R S

1		H				
2		I				
3		N				
4		B				
5		Ü				
6		N				
7		A				
8		K				
9		U				
10		R				
11		D				
12		I				





Dirok dibeje

Li Iranê bi navê Dehak şanek
zalim hebû.



Rojek ji rojan egeke pis li
şahê zalim
Peyde bû.

Li ser milê wi du birinê
bê derman derketin.



Doktor 3 hakiman tu derman
ji eşa wî re nedîtin.



5

Dehak aciz kû.



çilo derman
ji bo eşa min
nîne!!

6

ka ji min re
bani tembûr
vanekî bikin ■



7

Dehak guhdarî tembûrvan dike.



8

BESE!
Bani doxtor
kin.



9

Tembûrvan qâb



10



11




12



13



14



15



16

celad mējiyâ zarokan anî



17



18



19



20

Pistî gendakî nexwesiya
Dehak dest pê kir



21





DÜMAHÎK
HEYE

35

22



1	E	N	I					
2	S	E	V					
3	P	i	Y	È	Ç	E	P	È
4	P	A	N	I				



5	K	È	R	A	K	A	L	A	N	T
---	---	---	---	---	---	---	---	---	---	---

6	K	E	V	I	R
---	---	---	---	---	---

7	M	A	M	O	S	T	E
---	---	---	---	---	---	---	---

8	P	E	N	È	R
---	---	---	---	---	---

9	B	E	R	Ç	A	V	K
---	---	---	---	---	---	---	---

10	K	Ü	S	I
----	---	---	---	---

11	F	I	R	O	N	E	K
----	---	---	---	---	---	---	---


12	B	É	R	I	K
----	---	---	---	---	---

13	K	E	Ç	I	K
----	---	---	---	---	---

14	X	A	N	I
----	---	---	---	---

15	B	E	R	O	S
----	---	---	---	---	---

16	N	È	R	V	A	N	G
----	---	---	---	---	---	---	---



www.arsivakurd.org

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA